ResearchGate

See discussions, stats, and author profiles for this publication at: https://www.researchgate.net/publication/333520330

Semiyanê Civakî û Niyeta Xwendekarên Sûrî li Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê bo Destpêkirina Karsaziyê (Social Capital and Entrepreneurial Intention of Syrian Students at Mardin Artuklu…

Article · June 2019

CITATIONS
0

READS
21

1 author:

Musallam Gelo Abedtalas
Mardin Artuklu Üniversitesi
21 PUBLICATIONS **13** CITATIONS

SEE PROFILE

Some of the authors of this publication are also working on these related projects:

pro poor tourism View project

The Economic Effects of Displaced People on AlBab Area- Syria View project

All content following this page was uploaded by Musallam Gelo Abedtalas on 31 May 2019.

The user has requested enhancement of the downloaded file.

"Artuklu Kaime Uluslararası
İktisadi ve İdari
Araştırmalar Dergisi
Y.2019, C2, S1, s. 63-72.

Artuklu Kaime International
Journal of Economics and
Administrative Researches
Y.2019, Vol.2, No.1, pp. 63-72.

Semiyanê Civakî û Niyeta Xwendekarên Sûrî li Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê bo Destpêkirina Karsaziyê

Mardin Artuklu Üniversitesi'nde Okuyan Suriyeli Öğrencilerin Sosyal Sermayesi ve Girişimcilik Niyeti

Social Capital and Entrepreneurial Intention of Syrian Students at Mardin Artuklu University

Musallam Abedtalas*

***** Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, İşletme Bölümü, abedtalasmus@gmail.com

öz

Mülteciler, yoksulluk ve işsizliğe karşı savunmasız bir grup olması nedeniyle, girişimcilik, onlarla başa çıkmanın en önemli araçlarından biridir ve şimdiye kadar mültecilerin girişimciliği ile ilgili çalışmalara çok rastlanmamaktadır. Bu nedenle, Suriyeli mültecilerin girişimcilik niyetiyle ilgili bu araştırmayı yaptık. Teorik arka plan olarak, Sosyal sermaye teorisi ve planlı davranış teorisinin bir karışımından faydalanıldı. Değişkenler arasındaki ilişkileri tahmin etmek için, yapısal eşitlik modeli kullandık. Sonuç olarak, sosyal sermayenin girişimci niyetinde önemli bir rol oynadığı, ancak ilişkinin dolaylı olduğu görülmektedir. Sosyal sermayenin tüm boyutlarının önemi aynı değildir. Buradaki en önemli boyut aile ve arkadaşlarla olan bağlantıdır. Girişimsel niyeti belirleyen en önemli belirleyici faktör ise öz yeterliliktir (davranış kontrolü).

Anahtar kelimeler: *Mülteci , sosyal sermaye, girişimcilik, planlı davranış teorisi, yapısal denklemler modeli.*

Abstract

As refugees are the must vulnerable group to poverty and unemployment, entrepreneurship is one of the most important tools for dealing with them, and till now there is no studies about the refugees entreprenuership, we carried out this research about the Syrian refugees' intention of enterpreneurship. A mix of the theory of social capital and the theory of planed behavior was used as theoritical background for relationships between the variables. The stractural equetions model SEM was used to estimate those relationships . As a result, it is found that social capital plays an important role in entrepreneural intention, but not directly, the significancy of the whole dimensions of social capital is not the same and the most important dimension was connections with family and friends. Also the most important determinant of enterpreneural intention was self efficay (behavior control).

Keywords: *Refugees, social capital, entrepreneurship, theory of planed behavior, structural equations model.*

Kurte

Ji ber kû penaber şikestinbartirîn grûp in li hember hejarî û bêkariyê, û destpêkirina karsaziyan yek ji giringtirîn amûr e ji bo têkçûnandina hejarî û bêkariyê ye, me ev lêkolîn li ser niyeta destpêkirina karsaziyê çê kiri. Me tevheviyek ji Teoriya Semiyanê Cevakî TSC û Teoriya Libata Pilankirî TLP bikar anî weke paşxaneya teorî, û ji bo texmînkirina tekiliyan di navbera guherbaran de me Modêla Hevsengiyên Avahîsaz MHA bikar anî. Di encamê de, hate xûya kirin ku semiyanê civakî SC roleke giring di asta niyeta karsaziyê NK de dilîze, lê ne bi rengekî rasterast. Rola hemû rehendên semiyanê civakî ne weke hev e. Diyar bû ku giringtirîn rehendê semiyanê civakî ew e tekiliyên bi malbat û dostan re TMD, û giringtirîn biryardarê niyetê xwebaweriya nasandî XN ye.

Bêjeyên Kilîdî

Penaberî, semyanê civakî, destpêkirina karsaziyê, teoriya libata pilankirî, modêla hevsengiyên avahîsaz

1. Destpêk

Li gorî raporeke Neteweyên Yekgirtî, li dawiya sala 2017 an jimara penaberan li cîhanê /25.4/ milyon kes bû. Ji wan nêzikî /6.3/ milyon kes ji xelkê Sûriyê bûn. Penaberên Sûrî hatine belvkirin li gelek welatan, lê bi piranî li Turkiyê ne. Li gorî wê raporê jimara penaberên Sûrî li Turkiyê /3424200/ in (UNHCR, 2018, 14). Ev jimara mezin ji penaberan berhengariya peydakirina derfetên kar û yekxistina civakî dide ber rûyê hukûmeta Turkiyê û penaberan bixwe.

Destpêkirina karsaziyê tê raçavkirin weke mîkanîzmeyekê ji bo xwesriya xwe, guncandinê bi rewşa xwecihî re û lipêşxistinê, bi taybetî lipêşxistina ji bin ve-ber bijor ve. Lewra ew perçakî giring e ji bernameyên lipêşxistina aborî û şerê li dijî hejariyê (Roxas and Azmat, 2014). Penaber bi taybetî şikestinbarê hejarî, bêkarî û perwêziyê (marginalization) ne.

Ev lêkolîn tevhevkirinekê ji Teoriya Semiyanê Civakî TSC û Teoriya Libata Pilankirî TLP bikar tîne, ji bo diyarkirina faktorên niyeta ciwanên penaber yên Sûrî, yên ku xwendekarên zanîngehê ne, bo destpêkirina karsaziyê binav bike. Bi hêviya ku ew faktor werin lipêşxistin û bibin beşdar di çareserkirina pirsgirêka hejariyê û bêkariyê de, di rewşa penaberiya xelkê Sûrî de, ya ku ta aniha li dirîjiya 8 salan berxwe daye. Dê lêkolîn bi vê şêweyê berdewamkirin: beşa duyem paşxana teorî ye, ya sêyem rebaz e, encam di beşa çarem de ye, û paşgotin li dawiyê tê.

2. Paşxana Teorî

Destpêkirina karsaziyê, bi vedîtin û anînbera derfetên karkirinê (qezencê) tê nûnerkirin, û weke çalakiyeke aborî di rewşa civakekê de pêk tê. Lewre ew dikeve bin bandora mercên aborî, civakî, çandî û siyasî yên civakekê. Ew nimûne ye ji karlêkirina di navbera kesayetî, civaka xwecihî û civaka giştî re (Percoco, 2012, McKeever et al. 2014). Lewre mirov kane li asta destpêkirina karsaziyan weke mijareke girêdayî bi du fakroran de binêre, taybetmendiyên kesan û hinek rehendên rewşa civakî. taybetmendiyên kesan weke dilkêşiya bi aliyê talûkeyan û pêkanên vedîtin û anînbera derfetên kar. Hinek rehendên rewşa civakî roleke mezin di handankirin an astengkirina destpêkirina karsaziyê de dilîzin, û di vî warî de têgeha semiyanê civakî xwe nîşan dide (Gedajlovic et al, 2013). Weke ku Kwon et al (2013) tîne ziman Elêksîs Dî Tokfîl di sala 1835 an de bal kişande ser pêkanên xelkê Dewletên Yekbûyî yên Amerîka DYA bi avakirina komeleyan weke sedem ji bilindiya asta destpêkirina karsaziyan. Di dema dawiyê de Potnam (2000) nîşana giringiya torên civakî û baweriya tê de da, weke amûrek ji bo hêsankirina gihîştina karsazvana bo jêderên aborî.

Li gorî Bird (1988) niyeta karsaziyê faktorekî giring e di têgihîştina pêvajoya avakirina pardariyên nû de. Îro jî bigiştî li destpêkirina karsaziyê weke pêvajoyeke nasandinê tê nêrîn (Baron, 2004). Gelek lêkolîneran nîşan dan ku biryara destpêkirina karsaziyê encama pêvajoyeke hişê aloze. Ji ber vê gelek caran Teoriya Libata

Pilankirî TLP hate bikaranîn ji bo diyarkirina vê pêvajoya hişî (Liñán, 2008). TLP sê biryardarên serbixwe guman dike ji bo niyetê. Yê yekem helwesta derbarî libatê ye. Gelo ew libat erênî an neyînî tê nirxandin? Yê dûyem civakî ye û bi navê nirxên kesî tê nasîn. Ew e fişara civakî ya nasandî ye, ya libatekê hêsan an asteng dike. Biryardarê sêyem asta kontrola libatî ya nasandî ye. Ew nîşana hêsanî an dijwariya libatekê dide (Ajzen, 1991). Bi vî awayî niyeta destpêkirina karsaziyê girêdayî helwesta kesanî ye (Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê DNK), fişarên civakî yên nasandî (carinan weke Zagonên Kesanî û carinan yên Civakî yên Nasandî ZCN bi nav dibe) û kontrola nasandî ya li ser libata avakirina pardariyan (Xwebaweriya Nasandî XN).

Gelek lêkolînên sepandar, li ser rola semyanê civakî, di bûyîna mirovekî destpêkirê karsaziyî de, hatin birêveçûn. Bi piranî roleke erênî dîtin (De Carolis et al., 2009, Bauernschustera et al., 2010, Doh and Zolnik, 2011, Percoco, 2012). Hinek xwedinên hûr jî hatin çêkirin, li ser têkiliya di navbera rehend û nîşanên semyanê civakî û despêkirina karsaziyê de. Williams et al. (2018) di lêkolîna xwe de nîşan da ku di destpêkirina karsaziyê de, semyanê civakî yê girêdanker roleke erênî dilîze, lê bi demê re tê gohertin û dibe kostek li ser karsaziyê. Di heman demê de, semyanê civakî yê lihevanînker roleke neyînî dilize. Lê Davidsson and Honig (2003) encameke berevacjî wê bi dest xistin, û nîşan dan ku semyanê civakî yê lihevanînker roleke erênî di destpêkirina karsaziyê de dilîze û semyanê civakî yê girêdanker roleke neyînî dilîze. Liao and Welsch (2005) di lêkolîna xwe de ti bandora semyanê civakî li ser despêkirina karsaziyê nedît. Bi giştî tiştê bala mirov kaş dike ewe ku piraniya encaman li aliyê bandora semyanê civakî ya erênî li ser despêkirina karsaziyê ne. Di heman demê de hinek lêkolînan encamên bervajc dan. Dibêtiya mezin ew e ku ev cudahî bi sedema cudahiya şêweyên pîvanê û rewşên civakî yên tê de lêkolîn pêk tê.

Li aliyekî dîtir hinek lêkolînan hewl dan ku asta destpêkirina karsaziyan bi riya niyeta destpêkirinê bixwînin, û bipiranî TLP bikar anîn. Di hewldana bersivdana pirsa: Çima semiyanê civakî li hin karsazvanan bîhtir ji yên dîtir bandorê dike de, De Carolis (2009) nîşan da ku semiyanê civakî bi rengekî nerasterast bandorê li destpêkirina karsaziyê dike.Ew bandor bi riya bilindkirina xwebaweriya nasandî bi cih dibe. Û weke me nîşan da, û li gora Ajzen (1991) xwebaweriya nasandî yek ji biryardarên niyetê ye. Liñán (2008) TLP bikar anî, û rola giring ya xwebaweriya nasandî û dilkêşbariya nasandî di niyeta destpêkirina karsaziyê de tekez kir. Lê diyar kir ku biryardarê sêyem rola xwe rasterast nalîze, lê bi şêweyekî nerastrast, bi riya herdu biryardarên dîtir bandora xwe dike. Xwendina Liñán et al.(2011) jî heman encam tekez kirin. Roxas and Azmat (2014) Teoriya Semiyanê Civakî û Teoriya Libata Pilankirî tevlihevkirin û niyeta destpêkirina karsaziyê xwendin. Di encamê de diyar bû ku bandoreke erênî ya semiyanê civakî li ser niyeta despêkirina karsaziyê he ye, bi rengekî rasterast an nerasterast, bi riya hersê biryardarên niyetê.

Hemû lêkolînên me nîşan dane hatine çêkirin di rewşên welatên aram û aşt de. Lê ta aniha, ti lîkolîn li ser rewşa panaberiyê û niyeta penaberan bo karasaziyê nehatine çêkirin. Ev xwendin dixwaze beşdar be di girêdana vê qelîştokê.

Ev lêkolîn dê weke ya Roxas and Azmat (2014) tevheviyekê ji Teoriya Semiyanê Civakî TSC û Teoriya Libata Pilankirî TLP bikar bîne. Ji bo pîvana Semiyanê Cevakî dê rêbaza Onyx and Bullen (2000) were bikaranîn. Lê gora wê rêbazê Semiyanê Civakî bi çar rehendan tê pîvan: Beşdarbûna di Civaka Xwecîhî de (BCX), Hestên bi Bawerî û Ewlehiyê (HBE), Tekiliyên bi Cîranan re (TC) û Tekiliyên bi Malbatê û Dostan re (TMD).

Pirsa serke ew e: çi bandora semiyanê civakî li ser niyeta destpêkirina karsaziyê heye? Ji bo bersivdana vê pirsê em dê hîpotezên jêrîn ezmûn bikin:

H1. Beşdarbûna di Civaka Xwecîhî de (BCX) bandoreke erênî li ser Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK) dike.

H2. Beşdarbûna di Civaka Xwecîhî de (BCX) bandoreke erênî li ser Xwebaweriya Nasandî (XN) dike.

H3. Beşdarbûna di Civaka Xwecîhî de (BCX) bandoreke erênî li ser Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN) dike.

H4. Hestên bi Bawerî û Ewlehiyê (HBE) bandoreke erênî li ser Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK) dike.

H5. Hestên bi Bawerî û Ewlehiyê (HBE) bandoreke erênî li ser Xwebaweriya Nasandî (XN) dike.

H6. Hestên bi Bawerî û Ewlehiyê (HBE) bandoreke erênî li ser Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN) dike.

H7. Tekiliyên bi Cîranan re (TC) bandoreke erênî li ser Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK) dike.

H8. Tekiliyên bi Cîranan re (TC) bandoreke erênî li ser Xwebaweriya Nasandî (XN) dike.

H9. Tekiliyên bi Cîranan re (TC) bandoreke erênî li ser Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN) dike.

H10. Tekiliyên bi Malabatê û Dostan re (TMD) bandoreke erênî li ser Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK) dike.

H11. Tekiliyên bi Malabatê û Dostan re (TMD) bandoreke erênî li ser Xwebaweriya Nasandî (XN) dike.

H12. Tekiliyên bi Malabatê û Dostan re (TMD) bandoreke erênî li ser Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN) dike.

H13. Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK) bandoreke erênî li ser Niyeta Karsaziyê (NK) dike.

H14. Xwebaweriya Nasandî (XN) bandoreke erênî li ser Niyeta Karsaziyê (NK) dike.

H15. Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN) bandoreke erênî li ser Niyeta Karsaziyê (NK) dike.

3. Rêbaz

Civaka ku me li ser lêkolîn kiriye xwendekarên Sûrî li Zanîngeha Mêrdînê ne. Jimara wan xwendekaran nêzikî 900î ye. Me nimûneyeke ketober ji 250 xwendekaran bijart û pirsiyarname li wan belav kir. 245 pirsiyarnameyên dagiritî li me vegeriyan û ji wan 225 pejirbar bûn, yên dîtir bikêmasî bûn. Lewre analîz le ser 225 pirsiyarnameyan hate kirin.

Me Modêla Hevsengiyên Avahîsaz (MHA) bikar anî. MHA, yek ji teknîkên analîza statîstîkî yên pirguherbar in. Ew di analîza tekiliyen avahîsaz de tê bikaranîn. Ev teknîk pêkhênaneke ji Faktor Analîzî û Analîza Regrasiyona Pirhêjmare, û tê bikaranîn di analîza tekiliyên avahîsaz de di navebera guherbarên pîvayî û yên veşartî de. Lêkolîner vê rêbazê hevyaz dikin çimkî ew pêvegirêdana pirhêjmar û bihevgirêdayî di yek analîz de texmîn dike. Di vê analîzê de, du cûreyên guhebaran têne bikaranîn: Guherbarên hindirî û yên derveyî. Guherbarên hindirî wek guherbarên paşko ne û guherbarên derveyî wek guherbarên serbixwe ne.

4- Encam

Me du taybetmendiyên demografîk, temen û netewe, yên mînaka xwe raçav kirin. Weke di tablo /1/ de diyar e . Piraniya beşdarên lêkolînê 81.7% di temenê nevbera 18-30 de ne, çimkî ev temenê xwendinê ye. Lê beşeke giring 15.2% di nevbera 31-40 de ne, û ev jî girêdayî rewşa Sûriyê ya taybet ku gelek xwendekar ji xwendinê qut kirin û ji nû ve vegerriyan bo xwendinê. Di nêrîna neteweyî de 74.7% Ereb in û 21.7% Kurd in, yên dîtir Turkmen û Sûryan bûn, ev jî normal e, gava mirov rewşa gelê Sûriyê ya neteweyî û girêdana taybet ye Mêrdînê bi gelê Sûriyê re berçav bike.

Tablo /1/ taybetmendiyên demografîk

Temen	**R**êje **(Ji sedî)**	**Netewe**	**R**êje **(Ji sedî)**
18-25	55.4%	Ereb	74.7%
26-30	26.3%	Kurd	21.7%
31-40	15.2%	Turkmen	0.9%
41-50	1.8%	Sûriyan	0.5%
51 û bijor ve	1.3%	Yên dîtir	2.3%
Hemû	100	Hemû	100

Tabloya /2/ yem astên Semiyanê Civakî û Niyeta Karsaziyê dide bir taybetmendiyên demografîk. Weke tê xûyan herku temen bilindtir dibe semiyanê civakî bilindtir dibe û niyeta karsaziyê jî bilindtir dibe. Li gorî neteweyan, bilindtirîn semiyanê civakî li rex (yên dîtir) e, û Ereb, Kurd , Turkmen û Sûriyan li pişt tên. Lê bilintirîn niyeta karsaziyê li cem Turkmena ne, dibe ko ev girêdayî tekiliyên taybet yê Turkmenan bi Turkiyê re be. Tiştê balkêş di vir de ew e ku asta semiyanê civakê bitevahî 3.44 e û ev asteke ne bilindê. Dibe ku eve encama bi sedema hilweşandina tekiliyîn civakî di rewşa penaberiyê de be.

Tablo /2/ Asta SC û NK

Temen	**Asta SC**	**Asta NK**	**Netewe**	**Asta SC**	**Asta NK**
18-25	3.36	3.77	Ereb	3.50	3.99
26-30	3.43	3.94	Kurd	3.24	3.57
31-40	3.64	4.28	Turkmen	3.18	4.80
41-50	3.71	4.05	Sûriyan	1.18	1.00
51 û bijor ve	4.02	4.53	Yên dîtir	3.75	4.20
Hemû	3.44	3.90	Hemû	3.44	3.90

Ji bo pîvana pêbawerî û tebayiya navxweyî ya pirsiyarnameyê me Cronbach's alpha bikar anî. Nirxê Cronbach's alpha di navber 0-1 de ye. Nirxê ji 0.7 bilindtir weke asteke pejirbar tê dîtin. Pirsa 3êyem ji DTK hate rakirin ji bo nirx rabe 0.7 an bilindtir. Encamên hesibandinê di tabloya (3) em de ֿxûya dikin. Weke tablo dide berçav nirx hemû ji /0.7/ bilindtirin, û ev nîşana pêbawariyeke pejirbar e.

Tablo /3/ Cronbach's alpha

Rehend	**Nirx**
Hemû pirsan	0.88
Beşdarbûna di Civaka Xwecîhî de (BCX)	0.73
Hestên bi Bawerî û Ewlehiyê (HBE)	0.74
Tekiliyên bi Cîranan re (TC)	0.70
Tekilitên bi Malabatê û Dostan re (TMD)	0.71
Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK)	0.80
Xwebaweriya Nasandî (XN)	0.72
Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN)	0.78
Niyeta Karsaziyê (NK)	0.89

Me Faktor Analîza Piştrastkirinê (FAP) birêve bir, ji bo pîvana pêbawerî û tebayiya modêla pîvanê. Weke ko tablo (5) dide berçav, nirxên barkirna guherbarên pîvayî liser guherbarên veşartî di asteke baş de ne, çimkî hemû ji /0.6/ bilindtirin. Hêja ye gotinê ye ku me pirsa sêyem ji XN rakir, ji ber ku barkirina wê ji 0.6 kêmtir bû.

Tablo /5/ FAP

Guherbar	Barkirina Faktor	Navîna Gohartoya Derkişandî
Bi pirabî ez xewbexş dikim bo alîkariya civaka xewcîhî	0.652	
Ez bi rêkûpêk bûyerên civaka xwecîhî beşdar dibim	0.763	
Ez endamekî çalak im di saziyên civaka xwecîhî de	0.742	
Bi piranî başdarî çalakiyên çaresekirina pirsgirêkên civaka xwecihî dibim	0.816	
Beşdarbûna di Civaka Xwecîhî de (BCX)		55,58%
Gava ez di kolanên civaka me de birêve diçim e bi ewlwhîyê hest dikim	0.672	
Bi piranî endanên civaka me cihê baweriyê ne	0.658	
Navûdengê civaka di warê ewlehiyê de heye	0.729	
Di civaka ez têde dijîm de mirov xwe weke di mala xwe de hest dike	0.600	
Hestên bi Bawerî û Ewlehiyê (HBE)		56.46%
Civaka min alîkariya min dike gava pêdiviya min pê hebe	0.605	
Gava ez liber zarokekî bim û ji malê derkvim ez kanim alîkariyê ji cîranan bixweazim	0.790	
Bi piranî ez serdana cîranên xwe dikim	0.810	
Bi Piran ez alîkariya cîranên xwe yên nexweş dikim	0.680	
Tekiliyên bi Cîranan re (TC)		52.67%
Bi piranî ez her hefte bi dost hevalên xwe re diaxîvên rûbirû and bi telefonê	0.664	
Bir priranî ez rojane bi çend kesan re sohbetê dikim	0.796	
Her hefte ez hinek dost û heval re xwarinekê derveyî malê dixum	0.703	
Bi piranî ez dost û hevalên xwe re derdikevime seyranan	0.771	
Tekiliyên bi Malabatê û Dostan re (TMD)		54.07%
Destpêkirina karsaziya xwe gelekî bala min kaş dike	0.820	
Ez gelekî şad dibim gava bi destpêkirina karsaziya xwe mijûl dibim	0.876	
Ez gelekî dilgerm dibim gava bi destpêkirina karsaziya xwe mijûl dibim	0.862	
Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK)		72.75%
Destpêkirina karsaziya xwe têştekî pêkbar e	0.860	
Destpêkirina karsaziya xwe têştekî zor e	0.670	
Ez bawer dikim ku ez ê serkeftî bim di destpîkirina karsaziya xwe	0.752	
Xwebaweriya Nasandî (XN)		58.43%
Mirov bi çavekî bilind li xwediyên karsazan dinêrin	0.602	
Karsazî cîkî civakî bilind dide mirove	0.794	
Karsazî mirove dike cihê rêzê	0.876	
Karsazî piristîj dide mirovan	0.820	
Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN)		60.81%
Destpêkirina karsaziya xwe gelekî bala min dikşîne	0.821	
Ez gelekî mijûr dibim bi destpêkirina karsaziya xwe	0.873	
Ez amade me ji bo destpêkirina karsaziya xwe	0.813	
Ez ê hemû keda xwe têxim destpêkirina karsaziya xwe	0.851	
Ez ê nêziktirîn dem de karsaziya xwe destpê bikim	0.849	
Niyeta Karsaziyê (NK)		70.84

Ji bo modela avahîsaz me nimînok guncaviyê ên di tablo /6/ de bidest xistin. Weke mirov kane di tabloyê de bibîne modêla me guncav e, çimkî hemû nêrxên hatine texmînkirin di astên pejirbar de ne.

Tablo /6/ nimînokên guncavdariyê

Nimînok	Nirxên texmînkirî	Standard
Nimînoka Guncaviya Hevberdar (NGH)	0.914	> 0,90

Kaya Çarguşe/Derceyên Serbestiyê	1.587	< 3
Navîna Şaşiya texmînkirinê	0.051	< 0,08

Ji bo ezmûnkirina hîpotezan me modela avahîsaz texmîn kir û encam di tablo /7/ de ne. Weke ku tablo dide nîşan, em kanin biryara xe li ser hîpotezan bidin. Hîpotez: H1, H2, H3, H6, H9, H13 û H15 hatin redkirin, çimî nirxê p > 0,05 ye. Hîpotez: H4, H5, H7, H8, H10, H11, H12 û H14 hatin pejirandin, çimkî p <0,05 ye.

Tablo /7/ Texmîna Modêla Standardkirî

Rêk	**Hawkolkeyê texmînkirî**	**P**
Beşdarbûna di Civaka Xwecîhî de (BCX) bo Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK)	0.285	0.355
Hestên bi Bawerî û Ewlehiyê (HBE) bo Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK)	1.348	0.036*
Tekiliyên bi Cîranan re (TC) bo Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK)	-3.205	0.007**
Beşdarbûna di Civaka Xwecîhî de (BCX) bo Xwebaweriya Nasandî (XN)	0.475	0.091
Beşdarbûna di Civaka Xwecîhî de (BCX) bo Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN)	0.141	0.249
Hestên bi Bawerî û Ewlehiyê (HBE) bo Xwebaweriya Nasandî (XN)	1.327	0.017*
Hestên bi Bawerî û Ewlehiyê (HBE) bo Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN)	0.279	0.239
Tekiliyên bi Cîranan re (TC) bo Xwebaweriya Nasandî (XN)	-2.803	0.004**
Tekiliyên bi Cîranan re (TC) bo Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN)	-0.767	0.074
Tekiliyên bi Malabatê û Dostan re (TMD) bo Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK)	2.773	0.000**
Tekiliyên bi Malabatê û Dostan re (TMD) bo Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN)	0.867	0.004**
Tekiliyên bi Malabatê û Dostan re (TMD) bo Xwebaweriya Nasandî (XN)	2.302	0.000**
Dilkêşbariya Nasandî bo Karsaziyê (DNK) bo Niyeta Karsaziyê (NK)	-0.283	0.248
Xwebaweriya Nasandî (XN) bo Niyeta Karsaziyê (NK)	1.085	0.000**
Zagonên Civakî yên Nasandî (ZCN) bo Niyeta Karsaziyê (NK)	0.063	0.332

*watedar e liser asta 0.05. **watedar e liser asta 0.01

5. Paşgotin û pêşniyarî

Weke encamên me diyar dikin, beşdarbûna di civka xwecîhî de BCX, bandora xwe li ser biryardarên niyetê û li ser niyetê bixwe ti ne. Ev encam bi ya Roxas and Azmat (2014) li hev nake. Dibêtiya mezin ewe ku ev bi sedema rewşa penaberiyê, ya dihêle mirovên penaber xwe ji civakê veder kin (isolate).

Hestên bi baweriyê û ewlehiyê HBE bandoreke erênî li ser biryardarên dilkêşbariya nasandî bo karsaziyê DNK û xwebaweriya nasandî XN dike, li ti bandora xwe li zagonên civakî yên nasandî ZCN nake. Gava em bidin ber encamên Roxas and Azmat (2014), tê xûyan ku hawkolkeyên me ji yên wan mezintirin ev nîşan dide ku hesta bi ewlehiyê di rewşa penaberiyê de gelekî giring e li beramberî rewşa normal.

Tekiliyên bi cîranan re TC bandoreke neyînî li ser biryardarên dilkêşbariya nasandî bo karsaziyê DNK û xwebaweriya nasandî XN dike, lê ti bandora xwe li zagonên civakî yên nasandî ZCN nake. Gava mirov bide ber encamên Roxas and Azmat (2014), tê xûyan ku hawkolkeyên me bervacî yên wanin. Ev nîşan dide ku, di rewşa penaberiyê de, her asta têkiliyên bi cîranan re TC bilind dibe asta biryardarên mirov bo niyata karsaziyê nizimtir dibe.

Tekiliyên bi malabatê û dostan re TMD bandoreke erênî li ser biryardarên dilkêşbariya nasandî bo karsaziyê DNK, xwebaweriya nasandî XN û zagonên civakî yên nasandî ZCN dike. Li gora encamên Roxas and Azmat (2014) hawkolkeyên me ji yên wan mezintirin. Ev nîşan dide ku tekiliyên bi malabatê û dostan re TMD di rewşa

penberiyê de gelekî giring e li beramberî rewşa normal. Gava em hemû rehendên me texmîn kirin hevber bike xûya dike ku giringtirîn rehend TMD ye, û piştre HBE tê. Lê ti rol ji BCX re ti ne û rola TC neyînî ye.

Derbarî rola biryardarên di asta niyeta kasaziyê de, hate xûyakirin ku ti rola dilkêşbariya nasandî bo karsaziyê DNK û zagonên civakî yên nasandî ZCN tine. Le roleke erênî giring ya xwebaweriya nasandî XN he ye. Di heman mijarê de Roxas and Azmat (2014) diyar kir ku giringtirîn biryardar DNK e û XN û ZCN li pişt tên. Ev nîşane dide ku rewşa penberyî mirov bîhtir xwe dide ser pîkanên xwe yên kesî ji bo niyet karsazî yê.

Li gora encamên me bidest xistin em kanin du pêşinyaran pêşkêş kin:

1- Ji aliyê hukûmeta Turkyê, civaka navnetweyî û saziyên alîkariya penaberan ve, pêwîst e bal û ked bê dayîn bu lipêşxistina tekilyên penaberan bi malabat û dostên wan re ji alîkî ve, û jî aliyê dîtir ve bîhtir paln û bernama werin çê kirin bu hemû astên xwendinê, perwerde û hîndarya penabran.
2- Ji aliyê lîkolîneran ve, pêwîst e lîkolînên werin çêkirin le mijara destpêkirina sazkariyê, lê sepandên li ser mînakên ferehtir û mezintir ji penabern be.

Jêder

AJZEN, I. (1991), The theory of planned behavior, Organizational Behavior and Human Decision Processes, 50(2), pp.179–211.

BARON, R. A. (2004),The cognitive perspective: a valuable tool for answering entrepreneurship's basic ''why'' questions, Journal of Business Venturing, 19, pp. 221–239.

BAUERNSCHUSTERA, S., FALCKB, O. and HEBLICH, S. (2010), Social capital access and entrepreneurship, Journal of Economic Behavior & Organization, 76, pp. 821–833, doi:10.1016/j.jebo.2010.09.014 .

BIRD, B. (1988), Implementing entrepreneurial ideas: The case for intention. Academy of Management Review, 13, pp.442–453.

DAVIDSSON, P. and HENREKSON, M. (2002), Determinants of the Prevalence of Start-ups and High-Growth Firms, Small Business Economics, 19, pp. 81–104.

DE CAROLIS, D. M., LITZKY, B. E. and EDDLESTON, K. A. (2009), Why Networks Enhance the Progress of New Venture Creation: The Influence of Social Capital and Cognition , Entrepreneurship Theory and Practice, 33(2), pp. 527-545 https://doi.org/10.1111/j.1540-6520.2009.00302.x

DOH, S and ZOLNIK, E. J. (2011), Social capital and entrepreneurship: An exploratory analysis, African Journal of Business Management, 5(12), pp. 4961-4975, DOI: 10.5897/AJBM11.095

GEDAJLOVIC, E., HONIG, B., MOORE, C. B., PAYNE, G. T. and WRIGHT, M. (2013)Social Capital and Entrepreneurship: A Schema and Research Agenda, Entrepreneurship Theory and Practice, pp. 478, DOI: 10.1111/etap.12042.

KWON, S. W., HEFLIN, C. and RUEF, M. (2013), Community Social Capital and Entrepreneurship, American Sociological Review, 78 (6), pp. 980-1008, DOI: 10.1177/0003122413506440.

LIAO, J. and Welsch, H. (2005), Roles of Social Capital in Venture Creation: Key Dimensions and Research Implications , journal of Small Business Management, 43(4), pp. 345–362.

LIÑÁN, F. (2008) Skill and value perceptions: how do they affect entrepreneurial intentions? International Entrepreneurship Management Journal, 4, pp. 257–272. DOI 10.1007/s11365-008-0093-0.

LIÑÁN, F., Rodríguez-Cohard, J. C., and Rueda-Cantuche, J. M. (2011), Factors affecting entrepreneurial intention levels: a role for education, Int Entrep Manag J, 7, pp. 195–218, DOI: 10.1007/s11365-010-0154-z.

MCKEEVER, E., ANDERSON, A. and JACK, S. (2014), Entrepreneurship and mutuality: social capital in processes and practices, Entrepreneurship & Regional Development: An International Journal, 26(5-6), pp. 453-477, DOI: 10.1080/08985626.2014.939536.

ONYX, J., & BULLEN, P. (2000), Measuring social capital in five communities. The Journal of Applied Behavioral Science, 36, 23–42.

PERCOCO, M. (2012), Entrepreneurship, Social Capital and Institutions: Evidence from Italy, Spatial Economic Analysis, 7(3), pp. 339-355, DOI: 10.1080/17421772.2012.694144.

PUTNAM, R. (2000), Bowling alone: The collapse and revival of American community. New York, NY: Simon & Schuster.

ROXAS, H. B., and AZMAT, F. (2014), Community social capital and entrepreneurship: analyzing the links, Community Development, 45(2), pp.134-149, DOI:10.1080/15575330.2014.880495.

UNCHR, (2018), Global Trends: Forced Displacement in 2017.

WILLIAMS, N., HUGGINS, R. and THOMPSON, P. (2018), Entrepreneurship and Social Capital, International Journal of Urban and Regional Research, pp.1-21, DOI:10.1111/1468-2427.12589.

Appandîs

Giraf /1/ Texmîna Modêla Standardkirî



View publication stats